EKOVARA NÛÇEYAN YA HEFTANE

09
HEJMAR

BOTAN TIMES
*Nûçeyên kurdî standardên navneteweyî...*

# DI SER KOMKUJÎYA HELEBCEYÊ RE 35 SAL DERBAS BÛN

**Di ser Komkujîya Helebceyê re 35 sal derbas bûn**

Beril Caymaz

**Riha: Lêmiştên siyasetê û çend tiştên din**

Omer Faruk Baran

**Gramer û Agir: Du Amûrên Emperyalîzma Lînguîstîk**

Serdar Şengül



# BOTAN TIMES

*Nûçeyên kurdî standardên navneteweyî...*

## EKOVARA NÛÇEYAN YA HEFTANE

13 ADAR - 19 ADAR 2023 • JIMAR 9 • SAL 1

Xwedî
**BOTAN INTERNATIONAL**

Edîtor/Nûçegihan
**Gulistan Korban Rençber**
**Berîl Caymaz**

Edîtor
**Murat Bayram**

Wergêr
**Yonca Sarsilmaz**

Rûpelsazî
**Ridwan Xelîl**

Bergsazî
**GrafîKURD**

www.botantimes.com

**BOTAN INTERNATIONAL**
**MEDYA LTD. ŞTI**

Xwedî
**Murat Bayram**

Midûr
**Yonca Sarsilmaz**

Pispora Pêşdebirina Çavkanîyan
**Kubra Sagir**

Şêwirmendê Weşanê
**Omer Faruk Baran**

www.botaninternational.com

EUROPEAN ENDOWMENT FOR DEMOCRACY

Fona Ewropayê ya Demokrasîyê piştgirîya Botan Internationalê dike.
Hemî berpirsiyarîya naveroka Botan Timesê
li ser Şirketa Botan International Medya Limitedê ye.

# BOTAN TIMES

BULTENA HAFTANÊ YA NÛÇEYAN









# NAVEROK


Bandorên Derûnî yên Karesatên Xwezayî: Minak û Lekolîn ....4

“Hewldana me ya çêkirina mûzîka kurdî em ber bi wêjeya kurdî ve birin” ....6

Gramer û Agir: Du Amûrên Emperyalîzma Lînguîstîk....8

Şalûngê şalûngê, ewrên reş û tarî, ne dirûzî ne dibarî.... 10

Riha: Lêmiştên siyasetê û çend tiştên din.... 11

Rêwîtîya Pantorekê .... 13

Di ser Komkujîya Helebceyê re 35 sal derbas bûn.... 15

Foto-nûçe: Kes nayê hawara me!.... 16

Endezyarê Jeolojîyê: Xweza îro an sibê tola xwe hildide .... 20

Bahoza Freddyê: Li Malawî û Mozambîkê 245 kes mirine .... 21

“Mirov ji bo neçin tiwaletê avê venaxwin” .... 22

Qedrîcan, Orwell, kurd û futbol.... 23

“Mehek e ez li nexweşxaneyê radikevim” .... 27

# Bandorên Derûnî yên Karesatên Xwezayî: Minak û Lekolîn

Canan Yalçın 18. 03.2023



*Wêne: Semsûr / Murat Bayram*

Karasetên xwezayî bûyerên wêranker in ku li seranserê cîhanê, bandorê li jiyana mirovan û jîngeha xwezayî dikin. Erdhej, lehî, tsunamî, şewat û felaketên din ên xwezayî dibe sedema windakirina jiyanê, wêranî, windahî û zehmetiyên din. Ev felaket ne tenê zirara madî didin, di heman demê de dikarin bandorek cidî li ser derûniya mirovan jî bikin. Di vê gotarê de, ez ê bi referansa gelek lêkolîn û mînak ên  jî cîhan ê, badoren derûnî yên kareset a bi hûrgulî pêşkêşî we bikim.

Di dîrokê de piştî karesatên xwezayî li gelek deverên cîhanê, bandorên derûnî gelek caran hatine dîtin. Wek mînak di sala 1994an de li Koreya Bakur gelek lehî rabûn û zêdeyî 200 hezar kes bê mal man. Piştî vê karesatê, gelek kes rastî; xizanî, birçîbûn, nexweşî û windabûnê û her wiha gelek nexweşiyên derûnî hatin. Tevî kontrola tund a hikûmeta li Koreya Bakur, bandorên derûnî yên karesetê hatin lêkolînkirin. Di lêkolîna Kim û Paik (1997) de, hate dîtîn ku piştî lehiyan, gelek mirovên li Koreya Bakur de stres, anksiyete û depresyonê çêbûye û ev yek jî dikare bandorên demdirêj çêbike. Lı Japonyayê jî sala 2011de piştî erdhej û tsunamî yê, gelek kesan de nexweşiya stresê ya piştî trawmayê (Post Traumatic Stress Disorder-PTSD) hate tespîtkirin. Gelek kes jî  nikarîbûn bi xemgîniya windakirina malbat û hezkiriyên xwe re rû bi rû bimînin (Kawamura, N., & Tachimori, H.,2016).
Di lêkolîneke welatekî din ê cîhanê li Endonezyayê piştî tsunamiya di sala 2004an de, hate zanin ku piştî karesatê, ji sedî 17ê mirovan bi depresyonê, ji sedî 47ê metirsiyê û ji sedî 21ê nexweşiya stresê ya piştî trawmayê (NSYPT) re rû bi rû mane (Dewi, D. S., & Himawan, A. ., 2010).

Li gel van minak ên ji cîhanê em dizanin ku welatê me jî mixabin welatek e ku gelek caran karesatên xwezayî lê diqewimin. Karesatên di rojên dawide qewimîn mixabin jiyana bi milyonan mirovan serûbin kir. Karesata erdheja ku li parêzgehên Mereş, Xetay, Osmanîye, Semsûr, Dîlok (Entap), Riha, Diyarbekir, Meletî û Edeneyê hejand û bû sedema mirina bi hezaran, bêmal mayîna bi mîlyinan merovan û êşeke nû di bîra me de hişt. Karesata lehiyê ya li Semsûr û Rihayê jî beriya ku em birînên xwe bipêçin dîsa em hilweşand in. Hewce dike ku bandorên derûnî yên van karesatan jî ji nêz ve bên lêkolînkirin û ji bo alîkarî û desteka pêwîst xebat bên kirin. Ji bo ku plansaziyek bi bandor were çêkirin ku alîkarî û piştgirîya pêwîst bê kirin, pir girîng e ku meriv encamên lêkolînên derûnî ên ku piştî karesatên bi vî rengî yên berê hatine kirin bivekole û fehm bike. Di heman dem de, ev

ji bo kesan ku manê tesîra karesetan de jî girîng e ku ew xwe ji nexweşiyên psîkolojîk ên muhtemel biparêzin, tiştên dijîn fehm fêm bikin û hestên xwe qebûl bikin da ku bikarin jîyana xwe berdewam bîkîn.

Ji bo mînak, di lêkolîneke ku piştî erdheja Wanê ya sala 2011an hat kirin de derket holê ku %63ê beşdaran depresyonê, %44ê metirsiyê û %32yê wan jî nîşaneyên NSYPTê dîtine (Demirbaş et al., 2014). Bi vî rengî, di lêkolînek ku piştî lehiya Rize ya 2019-an hate kirin de, hate dîtin ku 35% ji beşdaran bi anksiyete, 25% depresyonê û 17% nîşanên NSYPTê(Güneri et al., 2020) bûne.

Helbet ev karesat bandorên neyînî li ser zarokan jî dikin. Gelek zarok nîşaneyên wekî aloziyên xewê yên piştî karesatê, metirsiya veqetandinê, guheztina rewş a hesteyarî, depresiyon û anksîyete nîşan didin. Di lêkolîna ku piştî erdheja Îzmîtê ya sala 1999an li ser zarokan hat kirin de hat dîtin ku ji %50ê zarok bi nexweşiya stresê ya piştî trawmayê ketin e. Wekî din, 25% ji van zarokan bi depresyonê re û ji% 20 jî bi nexweşiya ansiyetê re rû bi rû man e (Öztop, H., Öztop, D., & Arslan, E., 2004).

Wekî ku van lêkolînan de jî tê dîtîn, yek ji wan bandorên psîkolojîk ên herî gelemperî ku piştî karesatekê tê jiyîn nexweşiya stresê ya piştî trawmayê (NSYPT) ye. NSYPT nexweşiyek e ku di encama stresa giran a ku mirov pê re rû bi rû dimîne pêk tê. Ew nîşanên wekî depresyon, anksiyete, hêrs, êrîşên panîkê û guheztina rewş a hesteyarî nîşan dide. Wekî din, semptomên wekî astengiyên xewê, kêmbûna baldarî, pirsgirêkên bîranînê, û vekişîna civakî jî dikarin bê ditin.

Bandorek din a psîkolojîk a hevpar a di mirovan de piştî karesatan tê dîtin anksiyete ye. Piştî karesatekê, mirov dest bi xema pêşerojê dikin. Îhtîmala dûbarebûna karesata ku wan jiyaye, derketina karesateke nû an jî nediyariyên ku di pêvajoya başkirina piştî karesatê de hatine jiyîn asta anksiyetê a mirovan zêde dike. Her wiha di gelek lêkolînên li ser bandorên derûnî yên karesatan de tê dîtin ku karesat bandorek berfireh li ser civakê dikin. Encamên gelek lêkolînan nîşan didin ku karesatên xwezayî di nav civakê de dibe sedema zêdebûneke cidî a ansiyete yê û ev demeke dirêj berdewam dike.

Ji bo ku kesan, bi bandorên derûnî yên karesatan re biparêzin gelek rêbaz dikarin werin bikaranîn. Ya yekem, girîng e ku hewcedariyên bingehîn ên mirovan di serdema piştî karesatê de werin peydakirin. Piştî ku hewcedariyên bingehîn ên wekî xwarin, av û stargehê pêk hatin, divê girîngiyê bidin pêdiviyên derûnî û di heyama piştî karesatê de karûbarên piştevaniya psîkolojîk werin dayîn. Wekî din, bî karanîna torên piştgirî ji mirovan re dibe alîkar ku ji hêla psîkolojîk ve bi hêz bimînin. Heval, endamên malbatê û civak çavkaniyên girîng in ku mirov dikare ji bo piştgiriyê serî lê bide. Her weha, mirov di heyama piştî karesatê de rûtînek rojane ji xwe re saz bikin û adetên xew û xwarinê yên birêkûpêk hebin ji bo xwe parastîna bandorên derûnî gîrîngin.

Di encamê de, bandorên derûnî yên karesatan girîng in û dikarin bandorek demdirêj li ser jiyana mirovan bikin. Her weha dive em ji bir nekîn ku kes û civak jî, dikarin li hember zehmetiyan berxwedanek û hêzek berbiçav nîşan bidin. Di vê rewşê de pêwîst û girîng e ku merov xwedî piştgirî û çavkaniyên derûnî ên bibandor bin. Bê gûman, avakirina civakan ji nû ve û ji bo karesatên pêşerojê amade bûyîn jî pir gîrîng e.

## Çavkanî:


Kim, B. S. K., & Paik, S. H. (1997). The impact of flood damage on the psychological symptoms of North Korean refugees. The American journal of orthopsychiatry, 67(3), 472-476.

Kawamura, N., & Tachimori, H. (2016). A Nationwide Survey of Post-traumatic Stress Reactions among the Japanese Population after the Great East Japan Earthquake: Implications for Mental Healthcare Needs. Journal of psychiatric and mental health nursing, 23(4), 204-213.

Dewi, D. S., & Himawan, A. (2010). The psychological impact of the 2004 Indian Ocean earthquake and tsunami on survivors in Indonesia. Psychological Reports, 106(2), 491-499.

Demirbaş, N., Kılınç, A., & Kılıç, C. (2014). The psychological consequences of the 2011 Van earthquake. Journal of Loss and Trauma, 19(1), 56-68.

Güneri, O. Y., Özmen, M., & Şimşek, B. (2020). The mental health impact of the 2019 flash flood disaster in Rize, Turkey. European Journal of Trauma & Dissociation, 4(2), 100092.

Öztop, H., Öztop, D. ve Arslan, E. (2004). 1999 Türkiye depreminin çocuklar üzerindeki psikolojik etkileri. İskandinav psikiyatri dergisi, 58(3), 173-178.

# “Hewldana me ya çêkirina mûzîka kurdî em ber bi wêjeya kurdî ve birin”

Beril Caymaz 18. 03.2023



**Koma mûzîkê ya Praksisê albûma xwe ya nû ya bi navê “Ferman/Derman” derxistiye.**

Endamên Koma mûzîkê a Praksisê ji Botan Times re qala albûma xwe ya nû kir.



Vê pêvajoya albûmê, gelek tişt li me zêde kir. Hewldana me ya çêkirina mûzîka kurdî em ber bi wêjeya kurdî ve birin. Bi rastî jî di encama vê yekê de du helbestên, helbestvan Şêrko Bêkesî di albûma me de bûn gotinên du stanan.

Yekemîn konsera me li Amedê di yekem festîvala Muzîkê ya Amedê bû. Em li wir jî bi rewşeka komîk re rû bi rû mabûn.

Di vê konserê de pankarta li pişt sahneyê de Praksis nivîsandibû, lê li şûna wêneyê me wêneyê komeke din a muzîkê hebû. Dema me pirs kir çima wisa ye, em hîn bûn ku beriya me komeke muzîkê ya bi navê Praksisê hebûye ku beriya me hatiye avakirin.



Piştî vê rewşê koma muzîkê ya din naskirîne û bûne heval. Dema koma duyem karên xwe pîçekî pêş xistîne, komê ji bo tevlihevî çênebe nav ji wê komê re hiştiye.

Endamê komê dîbeje ku “ji ber vê yekê me bi rengekî hevgirtinê dest pê kir”

**“Em ê vê lîstikê xera bikin”**

Ferman/Derman bi rastî çîroka dijberîya lihevnehatinê ye. Em binê vê dijberîyê xêz dikin û behsa gotînê navdar ên Tatar Ramazan dikin: ‘Em ê vê lîstikê xera bikin’

Stranên di vê albûmê de ji bo me xwedî çend taybetmendîyên cihê ne. Berîya her tiştî stanên di vê albûmê de demekê li konser, qedên çakalîyê û civînên hevalan hatin lêxistin. Bi bertek û tevkarîyên guhdarvanan re pêş ket û ji bo qeydê amade bû.

**“Di vê albûmê de me cih daye 3 stranên kurdî”**

Di vê albûmê de me cih daye 3 stranên kurdî. Ev stranên komeke nû ya mûzîkê ne. Em plan dikin ku di nava kolektîfê de ava bikin. Me ev stran ji bo vê albûm deyn kirine. Dema me koma nû ava kir, em hevîdar in ku gel stanên kurdî yên têkoşînê lî repertuwara muzîka Kurdî zêde bikin.

Erdheja ku me vê dawiyê dît dilê gelek kesan şewîtand. Ji bo dermankirina van birînan em ê di meha Nîsanê de li herêmê erdhêjê bin. Her wiha em hewl didin bi konserên ku li Îzmîrê tê dikin, piştgiriyê bidin herêmê û yên ji herêmê tên.

1ê Nîsanê roja şemiyê li Navenda Çandê ya Adnan Saygun a Îzmîrê bi beşdariya Ahura, Praksis, Orkestra Sokak, Neva Pangea, Kasım Taşdogan, Bora Şahinkara, Nouran, Can Umut İleri, Çigdem Taş û Eren Dutlu dê konserek bê lidarxistin.



# Gramer û Agir:
# Du Amûrên Emperyalîzma Lînguîstîk


Serdar Şengül 18. 03.2023



*Rupelek ji Pirtukên Pîktoral a Aztec, arşîv*

Di sala 1492ê de, Antonio de Nebrija, humanîst û zimanzanekî îspanyolî, pirtûka xwe ya li ser gramera zimanê Kastilyayê qedand û îthafî Keybanuya Îspanyayê Isabella kir. Pirtûk di nav zimanên Ewropî de yekemîn pirtûka gramerê bû. Nebrija, di pêşgotinê de hêvîya xwe jî eşkere kir: *“Zimanê Kastilyayê dê bibe nîşana împeratoriya cîhanê ku hêvîdar e ku Îspanyayê ava bike.”* Û piştre dustûra humanîstê îtalî Lorenzo Valla ya *“ziman her tim hevrêyê împeratoriyê bû”* daxîlî ithafa xwe ya bo Keybanû Isabella kir.

Ew ne tenê hewldanek û arezûya Nebrija û Îspanyayê bû. Peter Burke, li ser têkiliya ziman û împeratoriyê bal dikşîne û vê hewldanekê wekî “emperyalîzma lînguîstîk” pênase dike û nîşan dide çawa îspanyolî, portekîzî, flemenkî, fransî û îngîlîzî ji sed salên 15an û 16an pê de li “dinyayên nû” belav bûne. Burke dîyar kir ku hikimdarên ewropî di hin rewşan de, hewl dan ku zimanên împeratoriyê li ser hemwelatiyên împeratoriyê yên xwecih, qet nebe li ser elîtên wan ferz bikin. Bi heman awayî, Şîrketa Holendî ya Rojhilatê zimanê flemenkî li ser Giravên Hîndê yên li Rojhilat ferz kiribûn.



*Rûpelek ji dîwana Melayê Cizîrî, Ji bo çavkanîyê bitikîne.*

Gramer bi tena serê xwe nikaribû arezuyê Nebrija pêk bîne û wê hewldanekê bibe serî. Gava Columbus û peyrevîn wî li Parzemîna Latîn Emerîkayê daket ne tenê bi zêr û zîvan, bi xan û eywanan lê bi pirtûkxaneyên gewre û bi hezaran pirtûkên ku bi alfebeya piktografîk (wêneyî)· hatine nivîsandin re rû bi rû mane. Metnên wan ji mijarên dînî bigre heta perwerdehî, felsefe û kozmolojiyê; ji hêla şêwazî ji helbestê bigre heta destan, mîtolojî, şano; nîşaneyên rewşenbîriyeke astbilind bûn.

Di vê gavê de agir bi hawara gramerê ve hat. Pîskoposê ewil ê Meksîkayê Juan de Zumerraga di sala 1530ê de li Tetzocoyê agirekî mezin da vêxistin ku tê de hemû îdol û pirtûk hatin şewitandin. Hemû şahid vedibêjin ku nîyeta wî jêbirîna dîrokê û rêvekirine li ber serdemeke nû bû. Zumerraga şewitandina hemû pirtûkxaneyên aztekan li ser xwe û mîsyonerên xwe wekî fermana olî ferz kiribû. Tetzoco ku wekî Atînaya Aztekan bû, gava bi fermana şewitandinê li ser hevdu hatine kom kirin, wekî çiyayeki ji pirtûkan xuya dikir.

Piştî şewitandina pirtûkan û pirtûkxaneyan, hilweşandina perestgehan û kuştina zanayan rê li ber hînkirina zimanê îspanî vebû. Dibistanên Latîn di salên 1530î de li Meksîka, li Michoacan û ya herî navdar Koleja Santa Cruz li Tlatelolcoyê hat vekirin. “Di vê kolejê de zarokên xwecihan piçek latînî û piçek jî îspanî hîn dibûn. Di sala 1584ê de hinek ji wan bi qasî ku bi latînî û îspanî bipeyivin, bi ser ketîbûn. Misyonerek neqil dike, keşeyek ku teze ji Îspanyayê hatiye, gava zarokekî xwecih pê re bi latînî axiviye çawa şaş û mat maye.

Romannûs Miguel Angel Asturias ku di sala 1967ê de Xelata Nobelê stendibû di pirtûka xwe ya Fesaneyên Guatemalayê de medeniyeta Maya ji xwe re kir bingeh. Asturias dibêje ku wî ew çîrok û efesane ji devê diya xwe ku eslê wê mayayî bû, berhev kirine û pirtûk jî îthafî diya xwe kiriye. Bi hevkariya gramerê û êgir, bi hevalbendiya humanîst û pispokopsan re zimanê ku rih û can didin wan efesaneyan nikaribû xwe li ser rûpelan bineqşîne.

Li wan salan li gundekê Amedê feqiyekê bi navê Seyfedîn li hicreya medreseyê bi dizî ji nusxeyekê perîtî ya Dîwana Melayê Cizîrî ku kaçaxçiyan ji binxetê anîbûn ji bo xwe nusxeyek kopye dikir. Gelo gramer û agir hukmê xwe li ser me çawa îcra kiriye?




*Antonio de Nebrija,*
*Deriyê Pirtûkxaneya Neteweyî ya Spanyayê, Madrid*

# Şalûngê şalûngê, ewrên reş û tarî, ne dirûzî ne dibarî...

Beril Caymaz 17. 03.2023



**Gelê Kurd xwedîyê gelek kevneşopîya ne. Lêbelê koçberîyên ku ji ber nebaşbûna rewşa aborî ya gelên herêmê pek hatiye û bi pê re jî guherîna cihanê bûye sedema jibîrkirina wan kevneşopîyan.**

Her wîha tê qebûlkirin ku gelek faktorên wekî cihê ku civak lê dijîn, asta jiyanê, şert û mercen îqlîmê, bawerî li pêkhatina kevneşopiyê dikin, hene.

Botan Times jî ji bo ve çend rîtuelên Kurdan berhev kir.

### Şalûngê

Li Sirûcê deştên fireh ji bo çandinîyê avantajeke mezin in. Ziwabûna havînê bandoreke neyinî li çandinîyê dike.

Dirsina ku 80 salî li gundekî Sîrûcê dijî. Ji bo baran bibare, wê qala rîtueleke berê kir. Li gundê wan jin û zarokan bi hewre rîtuela bi navê "Şalûngê" dikirin.

> Ava me tune bû, bo me pir zehmet bû ku em gund bimana. Me nikanîbû erdên xwe biçanda. Me biharê tîştên xwe berhev dikirin, bi deve û heywanên xwe re diçûn zozanan û havîna xwe li wir derbas dikir. Em di payîzê da vedigerîyan gundê xwe. Her çiqasî zivistan bû jî baran nedibarîya. Me jî jinên gund re derpêyeka jinên pîr li kerekî dikir û çavên wî digirt.

> Lî nêzîkê gundê me çayek ji çemê Firatê dihat û hîn jî heye ew çay. Em bi ker û zarokan ra diçûn wê derê û dihatin. Paşê mal bî mal digerîyan. Me ji malan bulgur, birinc, pîvaz, îsot distand, firavînan çêdikir û dixwar. Me hêlekî dia dixwand hêlekî jî stran digot. Berê me wanî îna dikir dê baran bibare.
>
> Şalûngê şalûngê
>
> ewrên reş û tarî
>
> ne dirûzî ne dibarî
>
> em hatine qulîng e
>
> tasek bulgur me din ku
>
> bila xwedê rahmeta xwe bide we

### Derzîyê dirûnê û dezîyê gewr

Li Sîrûcê rîtueleke din ya ku hîn jî tê kirin, "derzîyê dirûnê û dezîyê gewr" e.

Pîrên li wir du derzîyên dirûnê û hinek dezîyên gewr li hev belav dikin. Ew qebûl dikin ku wanî bi hev re helalî distînin.

> Em li gund in, ji ber vê carna li malê tiştê xwerinê wekî bulgur, şekir, çay nedima. Carna nikanibû em herîn Sirûce wana winin (bînin). Me jî diçûya ji merîyên xwe ya jî cîranan distand. Yê me ji ciranan distant carna bîr dikir ku em disa pêdin. Însan wextê pîr dibe pir tiştan bîr dike.
>
> Min 2 metreyên dezîyê şeltan û derzîyên çûçik kirî û li her jinekê gund belav kir. Tenê carekê tê kirin. Nîzanim mezînên me wanî dikirin. Û digotin dema wana belav dikin heger heqê me yê li ser jinên din hebe, bi van derzî û dezîyan ra heqê xwe didim.
>
> Heger em nedin wê çaxê li dinyayê din dê bulgur û şekîr ji me hesaban bipîrse. Derzî û dezi bîna şûna bulgur û şekîrê ye ku em belav dikin. Werga em heqê hev didin.

# Riha: Lêmiştên siyasetê û çend tiştên din

Omer Faruk Baran Omer Faruk Baran 16. 03.2023



*Ruha*

Bi sê hevalên din yên rojnameger re bi lezûbezê li texsîyê siwar berê me li Riha ye ji Diyarbekir. Barana berê hinekî hûrik hûrik hinekî girik girik dibare her ku em nêzîkî Riha dibin mîna bi kîn û kerb be neh qat-deh qat dişidîne û sert û pir sert diçerpîne rûyê erdê. Çirpeçirpa baranê tirs û xofê diniqutîne dilên me û gumanê çêdike ku em bi silametî nikanin herin Riha. Rê rêya her tim, dirêj dibe û dirêj dibe. Lê şikir, bi şorên şikirdar em dibînin ku em li bajêr in ku lehî lê rabûye û daye ber xwe.

**Sewtên tarîxî û şoka bajêr**

Ro qulibîye esir, av aşt bûye daketiye çîşkî, bes rû û sûretê bajêr mîna ku sewtên tarîxî bihîstibin hîn di şokekê de ye çi bigir. Herîya pir ne nasê bajarên betonî ye nola gundîyekî hê nû hatiye Riha xerîbhal li asfalta reş dirêj û pahn bûye. Rabûnê, lehî rabûye û her tişt kiriye lêmişt: Ferên şimikan, sîtil û satil, balgi û betanî, cil û cêrax, belgeyên nexweşxaneyan, defterên deynan, kitabên testan, û bi sedan hûrmûrên din yên hîn neketine vîdyo û fotografan.



**Kes newêre şorê bike**

Em li nexweşxaneyeka lehî lê qelibîye disekinin ku rewşa dawî ho bibin. Ne doktor, ne memur, ne sekreter kes newêre rasterast malumatekê bide. Heta bêje berpirsê temamê doktor û nexweşxaneyên Riha ji me re dibêje ku wê walî ser afatê agahîyan bide. Walî jî bo şorekê bike bi wezaretê re danûstandinê dike. Trajîkomîk e, rayedarên hikûmet û dewleta Tirkiyê li bajarên dûrî merkeza Enqerê jî heta paytext xeberê nede neşîne nikane bi îzn û îradeya xwe kevirekî biçûk î rê digire ji şûnê rake. Bêyî tesdîq û piştrastkirinê, em ji ambulansên li pêş nexweşxaneyê hatine hazirkirin texmîn dikin ku rewşa nexweşên li qatên jêr xerab e û ew dikin werin neqilkirin.

**Çilkek av li zengînan nakeve**

Mêrikekî ji Tirkîya wê bêlî ye Erebê Riha ye, ez jî bi xwe ji vî bajarî me loma zanim, gava em ji hewşa nexweşxaneyê derdikevin nêzîkî me dibe û bi şertê ku em navê wî nenivisîn, fotograf û vîdyoyên wî negirin agahîyên pir enteresan dide ser rant, bertîl, perexwarinên li Riha. Li gor gotina mêrik, herkes li pereyên xwe dinêre û kî miriye maye jî ne xema wekîlan e û dîsa li gor gotina wî zati çi dibe li miletê feqîr dibe, çilkek av jî li zengîn û malmezinan nakeve.

Ji vê ziqaqê derkeve here yeka din, ji wê derkeve here yeka din ya hîn yeka din, ez û hevalên xwe ji hev qut dibin û ez bi rêberî û çavnasîya xortekî ez nas nakim dikevim ziqaqekê ku tarîya êvarê zû hatiye ser.

**Tirkîya şikestî ya Kurd û Ereban**

Mexdûrên lehîyê çito çav li min û kameraya min dikevin bi feryad û fîxan behsa perîşanîya xwe dikin, ekserî Kurd û Ereb in, bi Tirkîyeke şikestî şorê dikin. Dibêjin ji sibe ve em telefon dikin, beledîye cewabê nade, dibêjin heta niha ye em bi satilan avê dikişînin derve, dibêjin ne cil man ne nivîn man, dibêjin me ji sibe ve parçek nan nexwariye, dibêjin kes nehatiye hawara me, me xwe bi zorê ji mirinê xelas kiriye. Keçikeke gulîdirêj, cil bi herîya şil û şepelî hinekî ji cîranên xwe dûr nêzîkî min dibe û bi hêvîya ku ez bi timtêla xwe ya xwendî halê wê fehm bikim û hawara wê binivîsim dibêje min ez bo îmtihanên unîversîteyê dişixulîm, defter û kitabên min, notên min bi avê re çûn, ez nizam ezê çi bikim çito bikim.

**Piştgirî û protestoyên sîyasî**

Dadigerim ziqaqeke din, wezîr û rayedarên hikûmet û dewletê cizmeyên zer di nigan de miletê mexdûr teselî dikin. Ji mexdûran hinek dibêjin Xwedê ji dewletê razî be, em sax in û mal û milk jî qet ne xem e, hinek dibêjin vîdanjoreka dewletê tune û mîna kef û kulmên destan bi kepçeyan avê ji bajêr derdixin.

Zarokekî 12 salî çav tije hêsir hewil dide xwe bigêhîne wezîrê hikûmetê ku derdên xwe bibêje, lê giregirên qelebalixê rê nadin wî. Çi ye, te xêr e dibêjimê. Dixwaze ku walî û wezîr werin halê mala wan, halê dê û bavê wî jî bibînin, lê kes guh nade wî. Jiber ku ez pir bi eyarên kameraya xwe ya nû nizanim û tarîya şevereşa bêceyran jî çongan li min sist dikin ez pê re naçim li rewşa mala wî nanêrim, lê bi qasî ew bibişire em sohbeteke li ser nigan dikin û xatir ji trajedîyê dixwazim.

Şor û gotinên li vî bajarî dibihîsim raber dikin ku protesto û piştgirî ji mexdûrîyê pirtir bi reng û dengên siyasî xwe didin der. Riha, ku bi Ereb, Kurd û Tirkên xwe bajarekî multî-kultî ye û di tarîxê de wer yê hatî re gotiye axam yê çûyî re gotiye paşam, bo silametîya siberoja xwe piştî lehîya 15ê Adarê ya 2023yan nîv-muxalîf e nîv-îqtidar. Hezar salî piştî Urfali Mateos yê ku weqayên sedsala 10an û 11an nivîsîne wanî dîtiye, wanî dibêje, wanî dinivîse di sedsala 21an de Urfali Omeros.

# Rêwîtîya Pantorekê

Hişyar Botî Murat Bayram 16. 03.2023




*Hatay*

Peyîza 2018'an li paytexta Swêdê Stockholmê me ez. Peyîz çiqas demsalek romantîk e, bayê peyîzê li welatê me hênîk e.

Dem dema xêr û bêr e, erê ji alîyekê xweza kirasê keske şîn ji xwe dike û li xwe dikê fîstanê zer, sor heta tazî işmit dîmîne, ji alîyên din jî, li welatê me dema çinîna hinarên zivzikê, tirîyên teyfê, alîsor , fisteqên Sêrtê û gelek fêkîyên din.

Îcar em vegerin peyîza Swêda İskandinav û vaykîngîyan. Swêd ji Rojava heta rojhilat teng e lê ji bakur heta başur çiqas dirêj e. Ji lewra jî Stockholm li başurê rojhilatê Swêdê dimîne. Peyîz e hê destpêka peyîzê ye serê îlonê ye. Li jor min piçkê behsa peyîza welatî kir , ji bo hûn peyîzên her dû welatan bidin ber hev.

Ji Stockholm em ber bi bakurê Swêdê ve diçin, nêzikê hezar km'yan em çûn , her deşt û her erda rast û ne çîya , ne gelî ne newal me ne dîtin. Ez zêde serê we ne êşînim, em gihan bineciha xwe, em ji erebê peyabîn, em çi bibînên?

Berf dibare, erê destpêka peyîzê berf dibare, sar e, em dicemidin, em ji xwe re dibêjin; ev çî ye ? Em hatin kû derê? Ji ber ku em ê zivistanê li vî bajarê sar derbas bikin, divê em hazirîya zivistanê jî bikin.

Ez bawer im êdî hûn dikarên taxmîn bikin, wê zivistan çiqas sar be li vî bajarê bakurê Swêdê. Gotinek ya Swêdîyan heye , dibêjin; Serma nîn e, cil û bergên neqenç hene.

Ji ber ku zivistan pirr dijwar derbas dibe, wek -30 , -35 pile , li Swêdê li ser cilên xwe de, pantorkê li xwe dikin da xwe ji sermaya dijwar biparêzên. Ev pantor taybetin, heta -40 pileyê jî mirov ji sermayê diparêzên. Sibata 2023 yan, xeberek reş û ne bixêr ji welatî hat, li Mereşê di rojekê de, du erdhej li pey hev çêbîye, tesîr li 11 bajaran kiribî, Hatay jî ji yek wan bajara bî.

**Xalê min û malbata wî, hevjîna wî û du kûrên wan jî li Hatayê dijîn. Piştî erdhejê , ti kesekî salûxdanên wan ne hilanîn her dû rojên ewilî.**

Piştî 2-3 rojan, me fêm kir ku, avahîya wan hilweşiyaye, ew jî di bin kavilan de mane, mixabin. Ez jî, ji Swêdê ber bi Antaqya derketim rê.

Heta Edenê ez ê bi teyarê biçûma, lê piştî Edenê ne dîyar bî ka ez ê çewa xwe bigîhînim Antaqyayê. Li teyara wê me ji Stenbol bibe Edenê, min camerek naskir ew ê jî biçûya Antaqya, camêr ji Elmanya dihat, wê biçûya hawara, mirov, nas û xizmên xwe yên li Antaqya.

Pêşîya were ji xwe re erebeyek kirê kirîbî wê bitenê biçûya, min jê pirs kir; ka gelo dikarê min jî bi xwe re bibe an ne?

Wî ji dil û can qebîl kir, ne dixwest tenê biçe, ji ber ku, ne dizanê di rê de çi li pêşiya wî ye. Ez û ew camêr bi hiş, mejî û ramanên xwe sedê sed ji hevdû cida bîn, lê em bîn rêhavelê hev, birîna me yek bî, bêçaretîya me yek bî, bêhêvîtîya me yek bî, rêya me yek bî.

Me baş dizanî ku li Antaqya kêmasîya gellek pêdivîyan heye ji xwe hawar û alîkarî dereng mabî. Ji ber vê yekê pêşiya em derkevin rê, me erebe tejî, nan, av , çixare benzîn û mazot kir û me da rê. Min dizanî wê sar be, ne qasî Swêdê jî be li wê dîsa jî sar be, ya xiraptir de dîyar e ezê çend rojan bimînim.

Min jî wek tedbîr pantorê xwe teybet kû heta -40 pileyî jî xwe li ber sermayê digre bi xwe re bir, berdestê sibhê em giham Antaqya, li ser kavilên avahîya xalê min kar û barê lêgerîn û rizgarkirênê berdewam dikir lê hê negihabîn wan.

Yên dixebitîn jî, karkerên kanza yên xwebexş bîn ji Zoguldakê hatî bîn. Ji xwe li qadê kesên dixebitîn, yên alîkarî dikirin, yên bi hawara gel hatîn, piranîyan wan mirovên xwebexş bîn.

Pirr sar bî, min jî pantorê xwe li xwe kir. Lê mixabin dema dilê mirov ji bêçaretî ji bêhêvîtî bicemidê, pantorê Swêdêyan jî feyde nakê, pantor tenê laşê mirovan germ dikê, ne dilê mirovan.

Her gotinek ji bo erdingarîya xwe ye, dema dilê mirovan bicemidê, cil û berg pere nakê. Ev bîst roj borîn li ser erdhejê re, lê hê dilê me dicemidê, hê welatê me dicemidê mixabin.



# Di ser Komkujîya Helebceyê re 35 sal derbas bûn

Beril Caymaz gov.krd 16. 03.2023



Di ser Komkujîya Helebceyê re 35 sal derbas bûn.

Di 16ê Adara 1988an de bi fermana Serokkomarê berê yê Iraqê Sedam Husên ji esman bombeyên kîmyewî bi ser Helebceyê ve hatibûn avêtin.

Di qetlîamê de herî kêm 5 hezar kesan canê xwe ji dest dan, zêdetirî 10 hezar kesan jî birîndar bûn.

Rêxistina Tenduristîyê ya Cîhanê (WHO) di rapora xwe de diyar dike ku ev êrîşa kîmyewî heta niha bûye sedema mirina zêdetirî 43 hezar û 753 kesan û seqetbûna zêdetirî 61 hezar kesan.

Li gor nûçeya Rudawê dema êrîşa duyemîn dest pê kir, bêhneke xurt belav bû. Kesên ku bûne şahidê wan kêlîyan dibêjin ku gaza bi "bêhna sêvan" di nava çend deqeyan de li nav bajêr belav bû.

Li gorî daneyên Neteweyên Yekbûyî, di navbera salên 1991 û 1994an de ji ber bombeyên kîmyawî nexweşîya pençeşêrê ji sedî 800 zêde bûye.

Hikûmeta Îraqê, Sedam Huseynî di 30'ê Berfanara 2006an de dar ve kir.

Komkujîya Helebceyê piştî Hîroşîma û Nagazakî wekî êrîşa kîmyewî ya herî mezin a sedsala 20emîn di dîroka cîhanê ya nûjen de hat tomarkirin.

# Foto-nûçe: Kes nayê hawara me!

Omer Faruk Baran 15. 03.2023




Riha piştî erdhejên 6ê Sibatê bi berbanga 15ê Adarê re bi lehîyê hisîya. Di serî de Tiktok, vîdyoyên milet ji platformên sosyal medyayê belavkirin di saetên pêşî de meziniya trajedîyê dan dinya alemê. Jêderên resmî li Riha hejmara mirîyên lehîyê yek li yek zêde kirin û ber bi êvarê re deh teqle kirin.



Lehîyê li merkeza Riha dar û ber, însan û erebe dabû ber xwe, ji lêmiştekê fereke şimikekê.



Avê qeydên nexweşên nexweşxaneyekê, ku îzin nedan ku em fotograf û vîdyo bikişînin, avêtibû derve.




Zarok geh bi lîsk geh bi girî bi tirs û xof li dora malên xwe bûn.



Ji wan zarokan yek ji hindur malê avê derdixe û li ziqaqê ro dike.



Mexdûrên lehîyê bi piranî li Eyubîye û Halîlîye ne ku her du jî li merkeza Riha ne.



Ereb, Kurd û Tirk in mexdûrên lehîyê. Hinek mexdûr bi sekneke sîyasî dibêjin em ji hikûmet û dewletê razî ne, afat mezin e û ev rewş jî normal e.



Hinek jî dibêjin êvar e, ne ceyran e ne çira ye, ji sibe ve em çiqas telefon dikin kes nayê hawarê, em tenê man, di tarîyê de man.

Fotograf û nivîs Omer Faruk Baran, Ruha, Edîtor: Murat Bayram, Diyarbekir

# Endezyarê Jeolojîyê: Xweza îro an sibê tola xwe hildide

Gulistan Korban 15. 03.2023






**Erdhêjên 6ê Sibatê bandorek mezin li bajarên herêmê kir.**

Vê carê jî li bajarên herêmê wekî Riha, Semsûr û Meletîyê lehî rabûye.

Bajarên ku hêj birînên xwe derman nekiribûn icar jî bi lehîyê re rû bi rû man. Tenê li Rihayê 12 kesan canê xwe ji dest dan.

Li gor nirxandinên Endazyarê Jeolojîyê Ûmît Ekeî, ger avahiyeke li dij xwezayê ango ne li gor usûlên axê bên çêkirin xweza îro ango sibê, sed sal derbas bibe jî tola xwe hildide.

Ekeî dibêje, berîya ku ev bûyer pêk bê pêşî lê dikarû bihata girtin.

**“Bi nexşeya keş û hewayê pêşî lê tê girtin”**

Endazyarê jeolojîyê Umît dide zanîn ku berîya avakirina pireke an jî avahîyeke, endazyar dikarin xwe bigihînin nexşeya keş û hewayê ya sed salan.

Ew dibêje ku nexşe di rupeala Gerînendeya Mudûrîyeta Metorolojîyê de cîh digre. Bi wê nexşeyê endezyar dikarin rê li ber felaketên bi vî rengî bigirin an jî bi xisara herî kêm jê bifilitin.

> Erê barana ku divê di nava meheke de bibarîya li Rihayê di rojeke de barîyaye. Lê kesên bajaran ava dikin jixwe divê vê tiştê bifikirin. Projeyên endezyarîyê jî li gor îxtîmalên herî xirab tên çêkirin. Em avahîyeke çedikin an jî rêyeke ava dikin em li dijî xwezayê çedikin. Ji bo wê divê em her îxtîmalê bifikirin.
>
> *Endezyarê Jeolojiyê Umıt Eke*

Eke sedema çêbûna lehîyan jî bi van gotinan tine ziman:

> Barana ku dibara divê derbikeve derve. Dema jixwe re rê yeke nabîne çi dide ber xwe dibe. Ji ber kêmasîyên di bajarvanîyê de jî dibe sedema lehîyan.
>
> *Endezyarê Jeolojiyê Umıt Eke*

# Bahoza Freddyê:
# Li Malawî û Mozambîkê 245 kes mirine

Botan Times 15. 03.2023



*Gundê Julia li parêzgeha Zomba ya Malawî / Ensarî Caymaz*

Bohaza Freddyê li parzemîna Afrîkayê tesir kir. Ji ber barana zêde li Malawî û Mozambîkê bi hezaran xanî di nava lehîyê de man.

Li gorî daneyên fermî li Malawî 225 kes, li Mozambîkê jî 20 kesan jiyana xwe ji dest dane. 707 kes birîndan bûne û 41 kes jî wînda ne.

Gundê Julia li parêzgeha Zomba ya Malawî jî malên ji axê hatibûn çêkirin ji ber bahozê hilweşîyane.



# “Mirov ji bo neçin tiwaletê avê venaxwin”

Gulistan Korban Dr. Mehmet Şerîf Demîr 14. 03.2023



**Li ser erdhêjên 6ê Sibatê re 37 roj derbas bûn. Lê li herêma erdhêjê hêj problemên av û hîjyenê nehatine çareser kirin.**

Gotina bijîşkekî ji Semsûrê ya,“Mirov bo neçin tiwaletê avê venaxin” rewşa heyî radixe ber çavan.

Doktor Aydin Şîrînî heta 6ê Sibatê li Semsûrê li navenda tendûristîyê kar dikir. Ew him mexdûrê erdhêjê ye him jî alikarîya mexdûran dike.

Di erdhêjê de mala wî û navenda ku lê kar dike xera bûye.

Ew û hevalên xwe konekî kirine wekî nexweşxane û li wir nexweşan derman dikin.

Wêne: Dr. Mehmet Şerîf Demîr

> Mirov bo neçin tiwaletê avê venaxin. An jî rojê careke diçin. Ev yek jî bandor li gurçikên wan dike. Ne li gundan ne jî li bajaran pirsgirêka av û tiwaletê hêj nehatiye çareserkirin.
>
> *Bijîşk aydin*



Li gor bijîşkî tunebûna tiwalet û ava paqij herî zêde tesîrê li ser jinan dike.

> Ji ber ku jin nikarin di seatên deregê şevê de biçin tiwaletê bi rojan xwe digrin. Ji ber vê di rêvîyên wan de nexweşî peyda dibin.
>
> *Bijîşk Aydin*

Di konan de bi dehan mirov niha bi hev re dijîn.

Li gor bijîşkî ev yek jî rê li ber nexweşîyên mîna gûrîbûnê, enfeksîyon, êşa rêvî û mîdeyê, ketina sipîyan vedike.

Li gel hişyarî û nirxandinên bijîşkên li herêmê heta niha tû tedbîr nehatine girtin.

Wezîrê Tenduristîyê Fahretîn Koca jî jixwe wekî bijîşkên li herêmê nafikire.

Koca berîya niha dîyar kiribû ku li herêma erdhêjê xetereya şewbê tune ye.

# Qedrîcan, Orwell, kurd û futbol

Înan Eroglu  Murat Bayram  14. 03.2023



*Alîgirên Amedsporê, Diyarbekir*

Yek ji metnên ewil ên kurmancî ku peyva “futbol”ê (bi awayê “fotbol”ê) tê de derbas dibe, wergeranek e ji Grigory Petrov.

Di *Welatê Zembeqê Gewr* de. Qedrî Can gava ev roman (“wergerandok” gotiye ji bo xwe) sala 1943yan di rojnameya *Roja Nû* de bi çendîn beşan tefrîqe kiriye, lê temam nekiriye mixabin, bêguman dê ne dûrî wê fikra di romanê de be, ya li hemberî futbolê.

Qet nebe ev gumana min e û ev guman, fikra serdest a civata me ya wê çaxê, riwangeya rewşenbîran di nîveka ewil a sedsala bîstan de, bi xumamî be jî, diyar dike. Tevî ku ev fikra han hê jî bi awayekî berdewam e.

“Miletê ku bi îlm û îrfan kêm mabûn,” dibêje Petrov, “ji Îngîlîzan hinek adetên kirêt girtin.” Yek ji wan adetan jî futbol e. Xortên nexwende û tiral bi futbolê diperist, nivîskarên totikvala di rojnameyan de li ser futbolê dinivîsî û xelk bi heyecanê dixist.

Di demekê de ku bengîtiya futbolê li cem fîniyan jî zêde dibe û hisa “heyf-stendin”ê ya ji swêdiyan kêm dibe (em dê piştre bibînin futbol ne ku tenê dikare hisa heyfstendinê kêm bike, lê herweha dikare zêde jî bike), dîplomat û feylesofê fînî Snellman û hevalên wî naxwazin çîpên stûr (futbol) bikevin şûna serên mezin (ilm û irfan).

Snellmanê ku piştî salan ji van fikran hinekî dûr dikeve, qala qenciya sporê dike û bi xwe jî dibe serekê fexrî yê civateke sporê, lê hê jî qebûl nake ku çîpên stûr di ser serên mezin re bin. Dibêje, “ey xortên Fîn!” û lê zêde dike: “Wezîfa we ne bilindkirin û firandina fotbolê ye. Divê hûn, şerefa miletê Fîn bilind bikin û bi hewa bixin.”

**Futbol û “milet”**

Miletek çawa bilind dibe? Derdê min û derdê vê nivîsarê jî ne ew e li dû bersiva vê pirsê biçe. Li ser wê fikrê me ku futbol ji bo miletekî bindest, mêtingehkirî, ne tenê alaveke kêfê û xurtkirina çîpan e.

Ew dikare bibe çirîskeke rizgariyê jî gava di dest “serên mezin” de be. Dikare bibe stargehek ji bo ku pena bibî nav wê û tê de bistirî. Dikare bibe derfeteke têkbirinê di qadeke sembolî de ji bo kesê li koloniyê da ku derzekê li kolonîsaziyê bixe û belkî cara ewil li vê qadê qayîşê bi kolonyalîstê xwe re bikişîne. Dikare meriv bi nasnameya xwe bihesîne, bi hebûna xwe. Dikare bibe şerekî berxwedanê, şerekî ku George Orwell ji bo wê dibêje “şerê bêsîleh”.

Orwellê ku piştî wergerana Qedrî Can bi du salan li ser maça futbolê ya rûsan-îngilîzan dinivîse, hemû nefreta xwe ya ji bo wê tê de qal dike, diyar dike ku hem futbol rê li ber neteweperestiyê vedike hem neteweperestî rê li ber futbolê vedike û ji bo misabeqeyên navneteweyî dibêje “provaya şer”. Bêguman Orwell rast dibêje, lê mimkin e tenê ji bo xwe dibêje, ne ji bo me, ne ji bo neteweyên ji hemû mafên xwe bêpar, ne ji bo kurdan.

Herçî şerê bêsîleh e, ew ji bo futbolê timî ne li dar e. Maça Amedspor û Bursasporê ya vê dawiyê du şerên din ên bisîleh jî anîn bîra min. Maça tîma Honduras û ya El Salvadorê di 1969an de ku wekî “Şerê Futbolê” tê zanîn û maça tîma Cîhadê ya Qamişloyê û tîma

el-Futuwayê ya Dêrezorê di 2004an de. Ev herdu maçên han û bûyerên berî wê û piştî wê qismek be jî bi bûyerên Amedspor û Bursasporê re li hev dikin. Berî ku meseleyê bînim ser van herdu maçan, em bînin bîra xwe bê çi di maça Amedspor û Bursasporê de qewimî.

**Êrîş ne bi tenê meseleya îro ye**

Amedspora ku 5ê Adarê bi Bursasporê re li Bursayê maça wê hebû, hê berî maçê rastî êrîşên Bursayiyan û Bursasporiyan hatibû. Bi sedan mirov çûbûn ber otela ku lîstikvanên Amedsporê lê bûn, dirûşmeyên nijadî li dijî wan berz kiribûn, marş xwendibûn, dabûn çêr û xeberan û fîşekên hewayî li ber serê wan teqandibûn. Dirûşmeya "bextewer e yê dibêje ez tirk im" jixwe vê yekê dibêje: Hûn çi jî bikin, hûn kurd in! Lê êrîşa mezin di roja maçê de, dema maçê qewimî. "Tirkên bextewer" hildabûn kêr û kevirên xwe, posterên qatilên kurdan û bi devjeniyeke nijadane bi ser Amedsporê de ajotibûn, posterê endamê JITEMê Mahmut Yıldırım (bi navê xwe yê kodî Yeşil), yê Pala (ku qerekterek e di rêzefîlma tirkan Kurtlar Vadisi de û rola Mahmut Yıldırım dilîze) û yê "torosa spî" (ku bûye nîşaneya kuştina kurdan di salên 90î de) bilind kiribûn, û kevir, berikên sîlehan û şûşeyên avê bi ser lîstikvanên Amedsporê de firandibûn. Ne tenê alîgir, lîstikvanên Bursasporê bi xwe jî êrîşî lîstikvanên Amedsporê kiribû û piştî maçê lîstikvanên Amedsporê rastî êrîşa polîsan jî hatibûn.

Êrîşa Bursasporê ne tenê ev e, zêdetirî deh salan e ku bi Amedsporê (Diyarbakırspor) re di nav şerekî de ye û xuya ye naxwaze bibe "şerekî bêsîleh".

Lê êrîşa li tîma kurdan a Diyarbekirê ne tenê meseleya îro ye, xwedî dîrokeke kevntir e. Gotinên Veysi Gönenç, lîstikvanê tîma Diyarbakırsporê, vê yekê piştrast dikin. Diyarbakırspor piştî ku di 1968an de ava dibe bi demeke kin diçe Kırıkkaleyê, û dema maçê ji hoparlaran dirûşmeyên wekî "kurdno derkevin" berz dikin, lîstikvanên Diyarakırsporê çar saetan di sehayê de asê dimînin.

Piştî vê maçê bi salekê, di 1969an de, li parzemîneke din, li Amerîkaya Latîn, maçek îcar di navbera Honduras û El Salvadorê de pêk tê.

Tîma El Salvadorê ya ku tê Hondurasê, li otela ku lê dimîne rastî êrîşa alîgirên tîma hember tê. Alîgirên Hondurasê dora otelê digirin, keviran diavêjin paceyên otelê, patpatkan diteqînin, li tenekeyanê didin, dirûşmeyan berz dikin. El Salvador di wê maçê de têk diçe. Piştî hefteyekê îcar Honduras diçe Salvadorê. Alîgirên El Salvadorê vê carê camên otelê tînin xwarê û mişkên mirî diavêjin lîstikvanan, dema maçê alaya Hondurasê tê şewitandin. Vê carê jî Honduras têk diçe. Alîgirên El Salvadorê êrîşî alîgirên Hondurasê dikin, du ji wan dimirin û bi sedan birîndar dibin. Ev yek şerê herdu welatan dide destpêkirin. Şerê ku sed saetan didome, rê li ber kuştina çar hezar kesan û birîndarkirina dozdeh hezar kesan vedike. Piştî vî şerî hesta neteweperestiyê li Hondurasê zêde dibe, Salvador axa ku dagir kiriye bi şûn de dihêle. Ev şerê navbera wan ne ji ber mêtinkarî-dagirkeriyê ye, ji ber pêla koçberiyê ye ku dike di navbera wan de dijminatiyek dest pê bibe. Lê em fam dikin futbol çawa dikare ruhê bindestan geş bike, herweha dikare zilma serdestan jî zêdetir bike. Çawa ku dikare nasnameyê û netewetiyê bi bîra ruhê bindest bixe, dikare dagirkirinê û mêtinkariyê jî bi bîra darê serdest bixe. Û dikare du serdestan jî bîne yek meydana şerî.

Em vegerin ser parzemîna me. Li parçeyekî din ê welatê me, li Rojavayê Kurdistanê, li Qamişloyê maçek di navbera tîma Cîhadê ya kurdan û tîma el-Futuwa ya ereban de pêk tê. Sal 2004. 12ê Adarê. Berî wê bi çar rojan, 8ê Adarê xweseriya Kurdistana Başûr bi awayekî fermî hatiye ragihandin. Alîgirên el-Futuwayê bi sîlehên xwe tên Qamişloyê, dema maçê ji kurdan re didin çêran, dev diavêjin Mesûd Barzanî û Celal Talabanî û posterên Sedam Huseyin bilind dikin, keviran diavêjin kurdan. Şer di navbera kurd û ereban de derdikeve, çar kurd ji aliyê eskeran ve tên kuştin. Ev şer û kuştinên han dikin ku kurd li Qamişloyê û bajarên din ên Rojava serî hildin, hêzên Sûriyê ji

van bajaran derdixin û nahêlin çend rojan hikûmeta Sûriyê bajaran zevt bike. Encamên vê maçê kurdan bêtir dike yek, wan li dor mafên netewî digihîne hev û hemû zilm û zexta li wan hatî kirin bi bîra wan dixe. Tesîra vê maçê bi salan didome û bêguman qismen rast e gava ku şahidên vê rojê dibêjin "şoreşa Rojava encama serhildana 12ê Adarê ye."

Tevî ku daxwaza rizgarbûna neteweyekê ne tenê ji ber fakterekê ye, lê fakterek mimkin e ku bike neteweyek zûtir hewl bide bigihîje rizgariya xwe. Ev maça han jî yek ji fakterên serekî ye di rêya wê ya rizgariyê de.

Ev maçên han û gelek maçên din fikreke weha bi min re çêdikin: Futbol bi qasî ku kêrî bindestan tê, bi kêrî serdestan/dîktatoran jî tê. Gotineke meşhûr heye, gava ji Salazarê dîktatorê Portugalê yê salên 1932-1968 tê pirsîn ka çawa ewqas salan kariye vî welatî bi rê ve bibe, dibêje "Tres F." Futbola ku yek ji van "F"yan e (herdu Fyên din fado û fatima/fiesta ne, bo têkiliya fadoyê ya bi desthilatê re hûn dikarin guh bidin beşa ewil a podcasta min li ser fadoyê), êdî alavek e ji bo Salazar da ku desthilata xwe xurt bike û mirovan bitevizîne, wan ji tevger bixe. Rewşenbîrên ku digotin futbol afyon e û li dijî wê derdiketin, qismen îşaret bi vê rewşa futbolê dikirin.

Mirovên ku bi futbolê ji ser hişê xwe diçûn bi kêrî desthilatê dihatin û li welatekî din, li Brezîlyayê, Getulio Vargasê dîktator piştgiriya tîma welatê xwe dikir, û her ku tîma welatê wî bi ser diket, desthilata wî xurttir dibû, welatiyên xwe bêtir pêbendî xwe dikirin, hestên wan ên netewî û pêbaweriyê xurttir dikirin. Li Kurdistanê, li Diyarbekirê, dewleta Tirkiyê ku dîtibû dikare bi futbolê kurdan ji lêgerîneke mafên jiyanî û netewî dûr bixe û wan bi kêfeke rojane mijûl bike, di ser karmendên xwe re piştgiriya Diyarbakırsporê kiribû û nexwestibû bê girtin. Ecêb e ne wisa? Belkî jî ne ecêb e gava ku meriv pê dihese xeteke zirav di futbolê de heye û ew top pir zû dikare ji aliyekî xetê biçe aliyê din. Ali Fikri Işık di kitêba xwe ya *Amedspor: Kaos ve Direniş* (Amedspor: Kaos û Berxwedan) de ji Necat Cemiloğlu neqil dike: *"Ji dema 1968an heta 1973yan ku serokê Amedsporê bûm, walî, fermandarên kolorduyê û fermandarên hêzên hewayî eleqeyeke mezin bi min da ji bo ku Diyarbakırspor li ser pêyan bimîne."* Ev eleqeya mezin ne ji ber xêra dê û bavê wan û ji ber çavê me yê reş û belek bû, her wekî ku Işık jî destnîşan dike, li pişt vê yekê û li pişt serkeftina Diyarbakırsporê hewldaneke wisa hebû ku dixwest ciwanên kurdan dûr bike ji siyasetê. Ev piştgirî heta salên 2000an jî dem bi dem domiya. Ali Gaffar Okanê ku dawiya salên nodî bûbû midûrê emniyeta Diyarbekirê, bi eleqeyeke "nedîtî" piştgiriya Diyarbakırsporê dikir, dixwest wê bike şampiyon û derbasî Super Ligê bike, lê ji aliyekî din ve nefret ji partiyeke kurdan HADEPê dikir û li gor gotina wî bi xwe, dixwest rayên vê partiyê ji sedî dehê kêmtir bike, tevî ku gelek kurd (dê ne dûr be ku HADEPî bin) heyranê wî bûn.

Tişta ku Petrov di romana xwe de qal dikir li vir diqewime: Tirkan xwest bi rêya futbolê hisa me ya heyfstendinê kêm bike û bi xwe ve girê bide. Futbola ku di dest bindest û kolonîzekiriyan de çawa ku hem dikare bibe alava xweparastin û berxwedanê û hem bibe alava jibîrkirin û bêtevgeriyê, gava ku dikeve destê desthilat û kolonyalîstan êdî dibe alaveke çewsandin, bişaftin û kolonîsaziyê.

Li bereya serdestan rewş eve ye, lê gelo li bereya me rewş çi ye? Em dibînin dewleta Tirkiyê destê xwe yê piştgiriyê ji bereya me ya futbolê daye alî û hewl dide pişt lê bişkîne, ji ber ku *pişta birîndar li ber qamçiyê xwe radibe* êdî, li hember wê. Lê bûyerên dawî yên futbolê li bereya me û gotara humanîzmaya fantastîk (bi gotina Mihemed Şarman) a Amedsporê piştî êrîşa Bursasporê (tirk) li wê (kurd), ez dam ber wê fikrê ka gelo futbola me jî bi ser dirbê siyaseta me ya heyî ve diçe?

Ev gotara ku derzekê li nasnameya Amedsporê dixe û tevî pêdagiriya alîgirên wê li ser kurdayetiyê jî (ku dema pêşwaziya wan bi yekdengî gotin "kî ne em? kurd in em") hewl dide wê ji pênaseya "tîma kurdan" dûr bixe, dê wê ji xisletê "berxwedan"ê jî bêrî bike ku li gor Ali Fikri Işık ev xislet digel "kaos"ê wê dike tîmeke berra.

Ev gotara ku behs dikim xwe dispêre du daxuyaniyên lîstikvanên Amedsporê yên

piştî êrîşa Bursayiyan û Bursasporê û tevî ku ne daxuyaniyên yekser ên Amedsporê jî bin, ji ber ku wê ew belav kirine, ev yek nîşan dide ku bi kêmî be jî fikra wê ewe ye. Yek ji van daxuyaniyan a Muhammet Raşit Yöndem e. Yöndem diyar dike ku ew heqê xwe li wan kesan helal nake ku jê re gotine terorîst û dibêje, "ez kurê vî welatî, dayikeke Bursayî û bavekî wisa me ku li saziyeke dewletê 15 salan xizmet kiriye."

Yöndemê ku tê bêjî qey ji kirinên vî "welat"î û vê "dewlet"ê bêhay e, dixwaze di ser Bursayîbûna (tirkbûn) xwe re xwe bi wan bide şîrînkirin û qebûlkirin. Ne tenê xwe, dixwaze hevalên xwe yên tîmê jî (kurd), bike "zarokên vî welatî". Hewla ku berê bi destê karmendên dewletê dihat kirin û dixwest bi rêya futbolê kurdan bi xwe ve girê bide û bike "zarokên vî welatî", xuya ye êdî bêyî wan, bi saya lîstikvanên futbolê bi xwe bi rê ve diçe. Lîstikvanekî din jî Cantuğ Temel e.

Temelê ku di daxuyaniya xwe de qal dike ku kurê polîsekî ye û di nav wan tiştan de ku alîgirên Bursasporê avêtine ser wan, herî pir bi wî tiştê nexşeya Tirkiyê xemgîn bûye ku alaya wan li ser bûye, ji ber ku ev ala, nirxekî vî welatî ye û nabe ku bikeve erdê. Herî dawî dibêje, "ricaya min ew e ku kes ji ber futbolê nemire, birîndar nebe." Mesele jî ev e ku kes ji ber futbolê namire û birîndar nabe, mesele ev e ku tîmek ji ber kurdbûna xwe rastî êrîşan tê. Û çima xema tîma kurdan be ku alaya tirkan ketibe erdê ku bi wê êrîşî wan kirine? Eve pirsek e ku bi her awayî li bersiva xwe digere. Û çima tîmeke kurdan mecbûr dimîne kesên di xizmeta vê dewletê û vê alayê de li cem xwe bihewîne? Qey dixwaze bibêje em jî ji we ne, em jî zarokên vî welatî ne, hewce nake hûn êrîşî me bikin. Nexêr! Tevî vê humanîzmaya fantastîk jî, ne cihê îhtimalê ye ev qamçî ji ser vê piştê rabe. Nexwe lazim e em zêdetir li vê îhtimalê bifikirin: Ev pişt çawa dikare zêdetir li ber qamçiyê xwe rabe?

Futbola ku xwedî şiyan e bi humanîzmekê mirovan û neteweyan di stadyûmekê de li hev bibane, xwedî şiyan e halana hestên netewî jî di wan de bide û di fersendeke herî biçûk de jî wan tûşî berberiyê bike, daxwazeke (sembolî be jî) biserketinê/têkbirinê (dekolonîzasyon) an jî binpêkirineke hê zêdetir (kolonîzasyon) bi wan re çêbike. Dîmenekî balkêş û karakterîstîk di fîlmê Kick Off Kirkuk (2009) ê Şewket Emîn Korkî de xwe dide der. Kurd, ereb û tirkmenên ku ji ber şerê Sedam Huseyin direvin û tên di stadyûmê de bi cih dibin û ev stadyûm ji bo hemûyan temsîla "stargeh"ê ye, gava ku li ser perdeya sînemayê li maça/fîlmê futbolê temaşe dikin, her wekî ku li maçeke zindî temaşe bikin, hildidin li kêleka hev alayên xwe li hember vê perdeyê bilind dikin: kurd alaya Kurdistanê, ereb alaya Îraqê. Di fîlmê Korkî de aliyekî biserketî nebû lê yê binketî hebû: Laytmotîfa hespê bêsiwar ê ku di temamê fîlm de, di nav sehayê de dida bezê, bêxwedîtî, bêwelatî û bêserweriya kurdan nîşan dida. Lê 25ê Îlona 2022yan, gava endamên CNKyê li Diyarbekirê, di maça Amedspor-Bursaporê de alaya Kurdistanê bilind kirin, dîmenekî berevajî fîlmê Korkî nîşanî me dan: dîmenekî serkeftinê/têkbirinê yê kurdan. Têkçûyên vê maçê ku destvala ji Diyarbekirê vegeriyan, ev serkeftin ti carî ji bîr nekir. Bûyerên li Bursayê, qismen encama vê serkeftinê ne.

**Baş e, lê Amedspor li kû dera vê serkeftinê disekine? Bê guman e ku ew di dilê kurdan û alîgirên xwe de her serkeftî ye û xwedî nasnameyeke kurdî ye. A ku ji Amedsporê jî tê xwestin ev e ku ew bêtir li vê nasnameyê xwedî derkeve û nehêle ku derz lê bikeve.**

Ne ku bi daxuyaniyên jorbehs gotareke belengaziyê saz bike û xwe bi serdestên xwe bide qebûlkirin, lê nasnameya xwe bêtir li ber çavê wan eşkere bike û ruhekî kurdî û neteweyî yê tîmekê bide wê. Zehmetiyên vê nasnameyê gelek in helbet, lê eger ev yek pêk neyê, futbola me jî her dê bişibe siyaseta me ya heyî û li wê "zirtxane"ya ku Celadet Alî Bedirxan di şûna "stadyûm"ê de bi kar tîne, em dê her zirtan bidin xwe û reqîbên xwe.

Belkî jî divê rêveberiyê Amedsporê kumê xwe deyne ber xwe û ji vir dest bi meseleyê bike.

# “Mehek e ez li nexweşxaneyê radikevim”

Gulistan Korban 13. 03.2023



Di ser erdhêjên Mereşê re, ku bandor li 10 bajaran kir, mehek zêdetir dem derbas bû.

Semsûr yek ji wan bajaran e ku di erdhejê de bi wêranîyê re rûbirû ma.

Siltan Hemşîre ya ku bi eslê xwe ji Semsûrê ye ji bo bajarê xwe dibêje, “Em ne dikarin vegerinê ne jî dikarin lê bimînin”

Ew bi salan e li Nexweşxaneya Kahtayê di beşa çavdêrîya krîtîk de kar dike.

Wê piştî xebatên bi salan ji malbata xwe re xaniyek kirîye, lê ew xanîya ku bi keda salan girtiye di şeva erdhejê de bi serê wan de hatiye xwarê.

Siltan Hemşîre dibêje ew û malbata xwe bi tesadufî ji felaketê filitîne.

**“Min dev ji malbata xwe berda çûm hawara birîndaran”**

> Jiyana me di şeveke de serûbin bû. Di wê felaketê de min dev ji malbata xwe berda ez çûm hawara wan kesên birîndar. Lê ne nexweşxane hebû ne jî xebatkarên rizgarkirinê.
>
> Siltan Hemşîre

**“Ne dikarim biçim ne jî dikarim bimînim”**

Di dema xeberdana me de, Siltan Hemşîre tevî ku di ser erdhejê re mehek derbas bûye jî nekaribû tiştên ku dîtine bîne ziman.

Wê dem dem bêhneke kûr digirt û car din dest pê dikir. Çavên wê tijî dibûn lê wê nedihişt ku hêsrên wê biherikin ser hinarikên wê.

Li hevok û peyvan digere Siltan Hemşîre. Dibêje, “Ez çi bêjim kêm e çi bêjim nîvço ye.”

> Li Samsunê me malek eyar kir. Min hemû malbata xwe şand wê derê. Wan nedixwestin biçin lê li vir ne kon heye ne jî mal. Ez tenê li vir im niha. Mehek e ez li nexweşxaneyê radikevim. Şev û roj ji min re wekî hevdu ne. Ne dikarim biçim ne dikarim bimînim. Naxwazim bajarê xwe berdim lê ez ê çi bikim?
>
> Siltan Hemşîre

Siltan Hemşîre ji bo li bajarê xwe bimîne hewil dide konteynirekê bi dest bixe.

Wê serî li gelek mercîyan daye, lê heta niha ji wan ne bersivek hatiye ne jî dengek.

Hêjayî bîrxistinê ye, Serokomarê Tirkîyê Recep Tayyîp Erdogan di rojên borî de li Semsûrê gotibû ku hin kêmasî çêbûne û ji welatîyên wir xwestibû ku heqên xwe lê helal bikin.

